# Boçî kurê kîvroşkê jin nedîna ?

Çîrok;
Firank Wintgin
Wergêran:
Mueyed Teyyib



Kêvrîşkê pîr gelek di xema kurê xwe da bû, ji ber
;ku jin nedîna. îna rojekê gazî kirê û gotê

Kurê min ezê pîr bum û tu jî yê mezin buy, tu bo çî jinê -
?naînî

Bab! Min gelek hizra xwe di jinînanê da kir û min -
?gelek hewil jî da lê çênebû. Tu dizanî bo çî
!Ne willa kurê min ez nizanim -

Li destpêkê min got, dê bo xwe kiça kûseleyî înim, ji -
ber ku kiçeka gelek jîre. Lê paşî bo min dîyar bû ne
.kiçeka rastgoye ji ber hindê min ne îna

.Tu yê heqî kurê min. Mirov jineka nerastgo na îne -

Paşî min got dê kiça marî înim. Lê mar gelek cilka -
.diguhurin ji ber hindê ez lêvebûm

Te baş kir kurê min. Jineka gelek cilka ji mirovî -
.bixwaze divîya mirov neîne

Paşî min got dê kiça pilingî înim ji ber ku geleka -
cuwane. Lê geleka hare û gelek neyar û dujmin hene ji
.ber hindê min ew jî ji hizra xwe îna der

Te vê carê jî baş kir kurê min. Mirov dê çi li jineka har -
!?ket

Paşî min got dê kiça hespê avî înim. Kiçeka xiru tijî -
.ye. Lê geleka debeng bû, ji ber hindê min ew jî ne îna

?Dîsa te baş kir. Dê çi li jineka debeng key-

Li dumahîyê min got dê kiça heftlîstik înim. Ew-
kiçeka beza ye. Lê kiçeka dizîkere ji ber hindê min ew
.jî neîna

?Te baş kir kurê min dê çi li jineka dizîker key-

Belê babo gelek baş e. Bes ez dibêjim; te bi vî dest û -
!darî jin ne îna



- Êdî min biryara xwe daye, kengî min kiçeka gelek cuwan û jîr û şahreza û rêk û pêk û bê qusîrî dît hîngî dê jinê înim. Ma ne başe bab?